Viyana Mela Muhsin Cwamêr =

Enfalkirina Diyalêkta Kurmancî

Muhemed Ebdulla

Tiştek siruştiye ku zaro li hemû cîhanê bi zarê (diyalêkt) dîya xwe bi axivin û bi xwînin, nexasim xwandinê, çunko armanca serekî ji wan cihan dibistanan wergitina zanistîye, lê muxabin kesekê Kurd ku ji xwera dibêje (Cwamêr) li xwe dimezêxe ji bo nehêlan û binbirkirina zarê Kurmacî, di çave Cxwamêr ê ne cwamêr da zarê Kurmancî ne Kurdîye û devera Badînan hemû Erebin û Kurdên bakor ji neviyên etaturkîne, bi dîtina mamosta Cwamêrî bi tinê zarê Suleymaniyê Kurdîye û di vê Kurd hemû bi vî zarî bixwînin...

Herwesa gelek caran jî dibêje zarê Suleymaniyê bûye zimanekê yekgirtî û Kurd hemû baş tê digehin û piranîya Kurmancan bi vê çendê di razîne, min divê ji Cwamêrî bipirsim; erê kengî biryar bi vê çendê htîye dan? Kê ew biryar daye? Kengî Cwamêrî rapirsînek kirîye û dîyar bûye ku xelkê devera Kurmancan piranîya wan diyalekta Sulêmaniyê dixwazin?

Dîsan dibêje ger li dibistana bi du zaran bihê xwandin wê welat parçe parçe bibe, lê ji bîrkirye ku li welatê Cwamêr lê dijît dinav wan dibistanan da bi gelek zaran dihê xwandin û welat jî parçe nebûye, her wesa Cwamêrî ji bîrkirîye ku zemanê dikatatoryetê, zemanê xwe sepandin û xwe ferzkirinê nemaye, nihe zemanê dîmukrasiyêye, zemanê mafê mirovîye, zemanê rapirsîne û rawergirtinêye...

Mele Cwamêr baş dizanît ku Etaturkî jî mîna Cwamêrî ji bilî zimanê Turkî çi zimanên din ne dipejirand, lê me pêzanîn li ser mela Cwamêrî hene û em dizanîn armanca wî ya serekî enfalkirina diyalêkta Kurmancîyêye, lê eve jî çi car bi dest wîve nahêt